Xelefê Zîbarî û sozdariya nejbîriyê

Bêwar Brahîm

bewar.brahim@yahoo.com

Ragihandin bûye girîngtirîn alav ji pêşketina jiyana rojane re, dibe ku welatên bindest hewcedartirîn welat bin ji alavên wisa hêsan re ku bi zûyî dengê doz û daxwazên wan digihînin tevahiya welatên cîhanê bê ku ti westanê yan zehmetkêşiyê bibînin.

Ne hewcedare ku em li dîroka yekemîn radyoya ku bi zimanê Kurdî hate damezirandin vegerin, di wan demên rabirdû de ku di bin bumbebarankirina tang û topên rêjîma Iraqê de cara yekem dengê axaftina bi zimanê Kurdî bilind bû û di guhên hemû welatên cîhanê de gotin: (evder dengê Kurdistana Iraqê ye). Ji wan dewrên berê seyda Xelefê Zîbarî dengê peyva Kurdî û taybet zaravayê Kurmancî bi dengê xweyî çiyayî bilind dike. Weke piraniya nivîskar û hunermendên Kurd, ez jî seydayê Xelefê Zîbarî bi rêya dengê wî dinasim, ku fonta tipên zaravyê Kurmancî weke barînên bikeve ser xakê wisa axaftina bi zimanê Kurdî-zaravê Kurmancî derbasî guhên guhdaran dibe. Berî ku TV û Internet derbasî malên Kurdan bibin hebûna radiyo di malan de ji nan û avê feriztirbûn bi rêya radyo li stiran û nûçeyên Kurdî guhdar dibûn, bi heserta guhdarîkirina peyvekê bûn ku bi zimanê Kurdî ji radyo bilindibû, min bi xwe ev rewş di mala xwe de dît lê hingê ez zarok bûm û netêgihştîbûm. Em ji xwedê spasdarin ku deriyên TV û Interent bi berfirehî li ber miletekî weke miletê Kurd vekir, lê pêwîste em

rol û bandora radyo û karmendên wê di wan dewrên berê de li ser bêsînorkirina û hevnaskirin û hevnêzîkirina miletê Kurd ji hev jibîr nekin. Min seyda Xelefê Zîbarî bi rêya stiranên nemir Mihemed Şêxo naskir lê bi demê re- bi rêya telefonê- min hê bêhtir ew naskir, dibe ku min ev bingeha xwe ya taybet şikenandibe ku ta mirov bi hev re nede û nestîne hevnaskirin çênabe, lê serboriyên jiyanê hişt ku bi nerînekê, yan bi helwîstekê, bi karekî çê yan xerab mirov hevalê xwe nas bike. Ji sala 1999 ê ve û ta vê kêlîkê seyda Xelefê Zîbarî min weke biraziya xwe dibîne, di wê salê de hevpeyvîna ku bi rêya telefonê ji bo dengê Emerîka beşê Kurdî bi min re kir li ser dîwana min (Bibûre ey evîn tu bê watayî) ya ku bi zimanê Erebî belav bû, lê ew pailpiştiya wî di hingê de ji min re bû hêzek ku di kar û xebata wêje û edebiyata Kurdî de berdewam bim, ya ku min qet bawer ne dikir ku çirûskên wê hevpyvîna wî bi min re bighin himbêza çiyayê Bagokê bi himbêzkirina gêrelayekî ji radyoya wî re, di wê çarşembê de weke piraniya caran hê şevê dest bi hatina xwe nekiribû, nobedariya wî gêrelayî bû ji zêrevaniyê re, tivinga xwe himbêz kiribû û kîskê tûtina xwe derxstibû û li ber xwe danîbû di ber pêçana çixareyekê re ew li benda dengê Xelefê Zîbarî bû ku dest bi pirogramê xwe(Ferheng û toreya Kurdî) bike, yê gêrela nizanîbû ku bi dengê Xelefê Zîbarî re wê bîrdanka wî deriyê xwe veke û navê bajarê wî,

navê dostê bavê wî û dawî yek ji hevalên zaroktiya wî li nav lat û zinarên wî çiyayî pê re bicivin û nobedariya wî di zêrevaniyê de bispêrin xwe. Ew bibû 17 sal ku ew gêrela çûbû çiya û agahîyên li ser warê xwe hem hema jibîr kiribû û dema li wê hevpeyvîna bi min re guhdar bû, bîrdanka wî ew vegerand gundê wî, bajarê wî û hevalên zaroktiya, dema wî bi xwe basha vê serbûriy pirogramê Xelefê Zîbarî ji min re kir dilopên hêsran di gewriya wî de asê diman.



Di sala 2000 ê de dîwana xwe (Warê Şêran) ji Emerîka ji min re şiyand lê dîwan ne bi navê Xelef bû ew bi navê Bengînê Zîbarî bû, min dîwana wî xwend lê her ez li helbesta (Nesrîn) vedigeriyam û niha jî bi dengê Mihmedê Şêxo gelek caran li vê helbestê vedigerim, min pirsa wê têkiliya nepen di navbera nesrîna Mihmed Şêxo û nesrîna Xelefê Zîbarî jê kir, min nizanîbû ku ezê bi wê pirsa xwe re bighim du çîrokên evîndariyê ku yek ji wan bi yek carê neçû serî û yan din qederê werîsê jiyanê di nîvê rê de ji dest kişand û axa mirinê ew di himbêza xwe de veşart. Nesrîn û Xecok du navên ku nemir Mihemed Şêxo û Xelefê Zîbarî ta roja îro ji hev cuda nekirine û du çîrokên evîniya nepen li nav xwe veşartine.

Jiyan zankoyeka mezine ji serbûriyan re lê hînbûna li vê zankoyê gelekî zehmete û rêya derbasûna wê û derçûna jê bi hevraz û kelem û kulibandinan dagirtiye, lê piştî ku mirov wê rêya dijwar derbas dike û digihê encam û destkeftiyên berz û bilind tevahiya êş û zehmetiyan didin jibîrkirin; dema min xelkê başûrê Kurdistanê di erda xwe de didîtin min digot qey ûcaxin yan firiştin; piştî min ew di erda wan de dît ew têgîn ji kok ve hilweşiya,di demên rabirdû de Başûrê Kurdistanê gelek çiya li ser sînga xwe bilind kiribû, war ji şêran re ava kiribû, gelek zevî ji gulîstanên rengîn re veqetandibû, lê bi demê re ew çiya nizim bûn û gelek ji wan herifîn, warên ku ji şêran re hatibûn avakirin bûne kavil, zeviyên ku ji gulîstanan re hatibûn veqetandin mane beyar ji ber li ser navên berpirseyarên dema emro tapo kirîne û nabe werin ajotin û dar û gul û kulîlk lê werin çandin tev bi stiriyan xemilîne. Zor dijware ku çaya di çavên mirov de nizim bibin, min gelek kes ji Başûrê Kurdistanê weke çiyayan didît, lê ew têgîn û dîtina min di erda Rojava de bû, dema min ew di erda wan de dît, ez bi xwe hest bûm ku ew çiyayên li ber çavê min bilindbûn ji mijê bûn ne ji lat û zinaran bûn. Ez susretmayî bûm bê çima ji welatê xwe hez nakin? Çima guhdariyê lê nakin? Çima ewqasî birçîbûna her tiştî li wan xistiye ji bilî birçîbûna pêşketin û zanînê û jiyana şaristanî? Çima dikevin pişt deriyan û wan deriyan bi hezar kilîtan li xwe dixlqînin? Çima ji 99% ol û êlîtiyê destên xwe danîne ser civaka wan û bêyî fermanên wan nikarin bilivin? Bi rastî ev rewş dilê min gelekî diêşîne, li ser wî welatê ku bi milyonan cangorî danîn, dema min dîwana(Warê Şêran) ji malika taybet bi pirtûkên nivîskar û rewşenbîrên Kurd yên Başûr derxist, weke ku xwediyên wan li ber min rawestyayî bin ez bi wan pirtûkan re axivîm:

- Hûn bi nirxê xaka Kurdistanê nizanin, hûn tama bayê azadiyê ji tama xwarin û vexwarinê nasnakin, hûnê kengî toz û telaza zexeliyê ji ser xwe dawşînin û dest bi şoreşeka nû bikin, şoreşeka zanyarî û rewşenbîrî ku çavên tevahiya cîhanê bişkîne?

Guherîna bingehîn dermanê civakekê ye ku ji guherînê ditirse, heke ev guherîn çênebe rewşa paşketî her weke xwe dimîne û eynî pirsgirêk û astengan mezintir û firehtir dibin, nezanî û nehênî pirtir dibin. Gelek ji min re dibêjin tu Kurdperistî, ez xweş bawerim ku ev dilêşiya min li ser Başûrê Kurdistanê ji vê Kurdperistiya min derdibe.

Her ku mam Xelef bi min re diaxive, em gelek mijaran gengeşe dikin, lê ku Tutiyê wî (Mîro)xwe derbasî nav gengeşê dike, ew ji tevlêbûna Tutiyê xwe li nav axaftina me aciz dibe û bi zimanê Englizî jê re dibêjî:
-Mîro şut up.
Hingê dîsa Kurdperistiya min destpê dike û jê re dibêjim:
-Tu çima di mal de bi Ingilîzî diaxivî, Tu çima Tutiyê xwe hînî zimanê kurdî nakî? Tu bi Englizî pê re diaxivî???
Jibîrkirina dost û hevalan di ferhenga mam Xelef de nîne, ew her dibêje ez Kurdên dewra berê me ezê çawa hevalên xwe jibîr bikim???
Xelefê Zîbarî, ev Kurdê dewrê berê, xakeke ji nesrînên wefadarî û Kurdperweriyê, ew û yên weke wî wefadar mane pir di navbera rabrdû û dahatûyan de ji bo parastina hêviyan li benda hatina rojên ku Başûrê Kurdistanê bibe kolkezêrînek di asmanê welatê cîhanê de.